


# ZARGOTINA KURDA





INSTITUT FÜR KURDOLOGIE - WIEN

---

ORDIKHANE JALIL  
JALILE JALIL

KURDISCHE  
ORAL-LITERATUR

MÄRCHEN UND ERZÄHLUNGEN

*In Kurmandschi*

9

WIEN 2015



**ÎNSTÎTÛTA KURDZANÎYÊ - WIEN**

---

**ORDÎXANÊ CELÎL  
CELÎLÊ CELÎL**

**ZARGOTINA KURDA**

**ÇIROK Û ÇIVANOK**  
*Kurmancî*

**9**

**WIEN 2015**

Çapkir: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien  
Herausgeber: Institut für Kurzologie – Wien

Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl

ZARGOTINA KURDA

Çîrok, çîvanok

Benda 9

648 rû + 16 rû ill

Wien – 2015

Karê ser kompyûtîrê: Cemalê Celîl (Alîonîs), Lusîka Gêrman û Nara Celîl

Mîzanpaj: Cemalê Celîl (Alîonîs)

Grafiка rûê yakê – A.Yûsûpova

Grafiка rûê dûdû û sisê: Malwa (Omar Hamdî)

Ordikhane Jalil, Jalile Jalil

KURDISCHE ORAL-LITERATUR

Märchen und Erzählungen

Band 9

648 S. + 16 S. Ill

Wien – 2015

© Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cemîla Celîl, Zîna Celîl

ISBN 3 – 902185 – 58 – 9



## Navarok

Pêşgotin.....	9
---------------	---

### KAVKASYA: Ermenistan

1 Sêva Sêling.....	23
2 Şarûr Bilbil.....	37
3 Gulîşa.....	61
4 Gulanç'kzêr'în.....	68
5 Jin jî heye, jinkok jî heye .....	81
6 Bek'semet.....	86
7 Gulbarîn.....	96
8 Zilfnaz, Cilfferez.....	103
9 Eh'medê mîrnasî, ç'eknasî, dur'nas .....	111
10 Kur'ê belek.....	121
11 H'ikyata Gul, Çinawir .....	131
12 H'ikyata p'adşê û herd kur'a .....	143
13 H'ikyata H'evka Hinêr .....	149
14 K'uçuk E'vdile.....	157
15 H'ikyata Fatima E'lî .....	171
16 H'ikyata Nîsko .....	176
17 Yazîya Xudê .....	179
18 E'lôe newêrek .....	181
19 Qazanca dar .....	190
20 E'lî, Walî .....	198
21 E'cem kizî .....	210
22 Ç'îr'oka E'mer-aşa .....	214
23 Şer' war, Şerîyet yox .....	221
24 Xatûn Meymûn .....	226
25 Çilkezî .....	245
26 Ç'îr'oka E'lo-p'aşa û Memed-p'aşa .....	261
27 H'ikyata h'imamê .....	275
28 Ç'îr'oka bêx .....	294
29 Nañî-beg.....	310
30 P'adşa û aqilfiroş.....	319

31 Nêrî çû .....	323
32 Sê heval .....	326
33 Şehrîban .....	331
34 Merzûmelek .....	342
35 Ç'îr'oka Bingir' .....	355
36 H'ikyata Üsiv û P'erîzadê .....	365
37 H'ikyata Dinya-gozelê .....	378
38 Ç'îr'oka Ah'medê-pîrê .....	383
39 Çîr'oka Gêlefûzê .....	389
40 H'ikyata qîza p'adşê û gur .....	398
41 Xortê dilê xa .....	402
42 Ç'îvo .....	407
43 Du bira .....	410
44 Dizê Şamê .....	413
45 Wezîr û p'adşa .....	420
46 P'adşa û gavan .....	423
47 Du simil .....	424
48 Xulamê bêe'sil .....	425
49 T'ir'alê Beşdayê .....	427
50 Ah'med-p'adşa .....	433
51 H'ikyata qotê sîs .....	438
52 Ç'îr'oka tudûqûşê .....	441
53 Ç'îr'oka Sindebad, Hindebad .....	455
54 Tîreme'r .....	461
55 Cibraîl û sê heval .....	467
56 Jin jî hene, jinkok jî hene .....	469
57 Kur'ê t'erzî .....	479
58 Wezîr û qîza aqil .....	485
59 Mîrze Mehmûd .....	488
60 Gurganê lawê pîrê .....	495
61 Kur'ê K'elo .....	503
62 Dêmar'î .....	512
63 Qesabî Comerd .....	527
64 Jin û mîr .....	534
65 Delûdûman .....	536
66 Sîrk'utok .....	545
67 Ter'a jî namîne .....	549
68 Ya meh'bûb ewe, dil h'ebandîye .....	551
69 Sinco .....	554

70 P'adşa û qîza aqil .....	560
71 Kûç'kê ît'bar .....	562
72 R'êwîti berbi Şamê .....	564
73 Kur'ê apê Polê .....	567
74 K'î bifroşe p'oşmane, k'î bik'ir'e jî p'oşmane .....	571
75 Fêl û fendê jinê .....	577
76 Te ku jin anî, neşîne mala bavê .....	579
77 Ev çî .....	582

#### PAŞKOK

1 Înglîs Çawîş .....	587
2 Tiştê cêr'ibandî bike, yê necêr'ibandî neke .....	598
3 Şe'detîya gongil .....	600
4 P'adşa û qîza wî .....	602
5 Dizê Şamê .....	604
6 Jin jî hene, jinikok jî hene .....	611
Nivîsarnasî.....	615
Kurtejîyana ç'îr'okbêja .....	628
Ferhenga p'eyvîn bîyanî û kêmnas .....	639
Navr'êzka ç'îr'okan bi alfâbêtî.....	642
Navr'êzka ç'îr'okên ç'îr'okbêja.....	645
Navr'êzka nîgara .....	648

#### FOTOALBOM

*Gundêñ kurdêñ-êzdî li nehîya Alagyezê (Ermenistan)*

Erdnîgarîya Ermenistanê .....	I
Alagyez (Camışluya mezin) .....	II
Camışlû.....	IV
Dêrik (Cercerîs) .....	VI
Şenkanî (K'orbûlaş).....	VIII
Ort'aç'îya (Quruboğaz).....	IX
Sîp'an (P'amp'a k'urda) .....	X
Sadûnts (K'arvansera) .....	XI
R'îya t'eze (Qundaxsaz) .....	XII
Mîrek .....	XIII
Kanîya şîr (Senger).....	XIV
Avşêñ (Çobanmaz) .....	XVI



---

---

## Pêşgotin

Çîrok janreke zargotina cimetêye here kevn û here naskirîye. Çîrokêñ hemû gelên cihanê hene. Ewana ji sedsalîyêñ kevn têñ û nava deba merivada kûr bingeh girtine. Çîrok hela hê ji dewra berî sinifyê destpê dibin û heta niha jî rêberî li jîyana meriva dîkin, xwestinêñ wane bedewetî razî dîkin. Çîrok meriv ruhdar kirine, hukumekî mezin ser fikirdarî, fantasia wî hîştine, çimkî nava wanda temamîya cêribandin û şuxulkirina merivaye bi dewr û zemana, xwestin û hesîna dilê wan heye.

Çîrok bi mecalêñ bedewetî fikirdarî, dinêdîtin û dîroka merivaêye berê derheqa dor û berêda, şerkarîya merivê berê himberîl şipûkêñ sirûştê bi sedan salan xwey kirine û îro dîhar dîkin. Lê nava dema dirêjda, çaxê ji silsiletekê derbazî ya dinê bûne û nava gelda hatine gilîkirinê, çîrok jî pêra hatine guhastinê, fikra wana rengekî nû stendine û bi wê yekê bi careke din guhastinêñ nava jîyana mexlûqetî dîhar kirine. Di dirêjaya dîroka merivayê kevtirînda, çaxê dijminê meriv hîmlî û sereke şipûka sirûştê bû, gele bûyarêñ sirûştê mexlûqetîya berî sinifî nikarbû têbigihîsta, şirove kira, ramanêñ xwe meriv nava çîroka bi syûjeyê sérê û sêrbazî dîhar dikirin. Lê hêna mexlûqetîya sinifîeda, çaxê meriv diha zêde serwext bû ser miqabilîhevbûnêñ sosîalîye navxweyî, ser hine hêzên sirûştê yên sext webû û kire bindestê xwe, rex çîrokêñ sérê û sêrbazî, çîrokêñ debêye nû pêjda hatin.

Nava çîrokada bi alêgorîa bedewetîye hukumdar, bi berçevanîna kûre meremkivş xem û xiyalêñ merivêñ xebatî dîhar bûne. Ji ber vê çîrok hesab dibin neynika bîrûbawarîa cimetêye bedewetî. Xenji nirxa bedewetî kemala çîrokaye zanyarîye mezin jî heye, çimkî nava wanda qinyatêñ bi nirx û dewlemend bona lênihêrandina pirsêñ sosial-dîrokî û netewetîye hene.

Nava sal û zemanêñ dirêjda gel timê ji çîroka hiz kirye, ew parastine û nava wanda şîretê qenc, xeysetê merivê helal û paqîj dîtye. Şerkarîya dijî xirabîye û zorbetîye bê barişî û efatî, xwestin û gumana berbi altindarîye berk, ku di çîrokada hatine kivşê, masaêñ zêrandî û kesîv ruhdar kirine. Mêrxasêñ gel nava çîrokada nîşana (sîmbola) qencîêne. Ew bi saya gumana gel timê jî xiravîye alt kirye. Xiravî çîrokada, anegorî têgihîştina gel, berê ewlin şipûkêñ qewmandinêñ sirûştê bûne: bobelîsk, tofan, vûlqan, birûsk û tiştêñ mayîn. Peyra di hêna mexlûqetîya sinifyêda, ew xiravî sinifêñ

kedxur, wekîlêن wan bûne. Bi cûrê alêgoryaê nava çîrokêن sêrêda sîmvolîka xiravîyê dêwên sê, h'eft û cil serî, zîya, mer, rewirêن mayîn dîhar kirine. Lê wexta qewatê qenc şuxul kirine: xalîçêd fironek, şiva quđretê, kumê niqitokê, hespên behrî, teyrê sîmir çûne hewara wan. Çawa Maksîm Gorkî divêje "Têma wan efrandinêن zargotinêye (çîrokaye O. C.) tomerî şerkarîya merive dijî sêrbaza, ku serwêrîê batinîêن tebîyetê dîkin, pêra jî xwestina xevatkarane, wekî biniv hukumdarêن batinîêن tebîyetê". Eva "têma çîrokaye tomerî", ya ku Maksîm Gorkî bi heqî dide kivşê, bawar bikî, nava efrandinêن hemû gelên dinyaêda hebûye. Ji ber vê jî divê em ecêbmayî nemînin, wekî nava çîrokêن gelên cuda-cudada gele cara têma, syûjê û fîkrêن mîna hev rastî me têن. Carna ev mînahevbûn raserî hev têن navbera gelên, ku bi okêana û kontînênta ji hev dûr û qetyâne. Mînahevbûna syûjê û nîgara di çîrokêن gelên cude-cudada carna usa pire, wekî meriv ecêbmayî dîkin. Lê eva yeka bi tomerîbûna îdêologîa merivêن xebatkar, bi wan qanûnêن dîrokî tê şirove kirinê, yêن ku nava pêvajoyêن anegorî hevda rêberiyê li pêşdaçûyîna giştîa mexlûqetîê kirine. Nava merem, dinêfemkirin û dinêzanîna merivêن kedkarî zêrandîda mînahevbûna kîp hebûye, ew usa jî nava efrandinêن wane zarda hatîye kivşê, îlahî di nava çîrokada.

Caxê gîlî hatîye ser çîrok, lîgênd û gîlî-gotinêن gel nvîskar û fikirdarê ûrisî mezin Maksîm Gorkî gotye: "Xwestina merivêن xebatkare berêye, ku xebata xwe hêsa bike, kardarîya wê blind bike, bê sîlihkîrinê dijî neyarêن çarpê û dupê, lê usa jî bi zora peyvîn bi cûrê "heyr û hijmekaryê hukmî ser nexşen sirûstê yêن dijminê meriva bike".

Di karê mînahevbûna çîrokaye têmatîk û navarokîda roleke berbiçev lîstine peywendîyêن navbera gelane malhebûnî, sîyasî û medenî, ku wedê derbazbûyîda hebûne û bûne bingeh bona wê yekê, ku efrandin hukmî ser hev bikin. Tiştekî eyane wekî çîrokêن gelên usa, çawa hind, fariz, ereb, ermenî, ûzbêk, kurd, tacîk û yêن mayîn êpêceyî mîna hevin. Lê ew mînahevbûn û tomerîbûn tenê dîharbûnêن mîhanîkî nînin, ku bona ruhê cimetê, bona xeysetê wê tiştekî xerîbin. Hela nava goveka şaxêن syûjêed mîna hevda jî xeysetê vî yanê wî mîletî dereceen emrê dîrokê, malhebûnê, kolorîta mîletzanîyê, cî û war gelekî eşkere dîhar dibin. Wekî usa nîbûya, jîyandarîya çîrokêن wa wê kin bûya û wê ji nava deba cimetê zû derketana. Lê çîrok bi wan derecêd xweye jorgotî dimînin çawa kardarîke mezin nava xezna medenetîya her cimetekêye mîletîeda.

Çîrokêن gelê kurda bi kevnadîrokê, pîrserecembûnê û dewlemendbûna syûjêan û pirbûna reng û awazêن bedewetîêva, di nava rîza çîrokêن gelên Rohilatêda cîkî berbiçev digrin. Topraxa, ku di Rohilata Nêzîkda kurd ser dijîn, cînartîya wane teví ereba fariza, ermenîya, tirka, mexîna, bêfitya, giringaya berevkîrin û lêkolîna janra zargotina kurdaye belabûyî û hizkirî, ya çîroka, dîkin tiştekî diha ferz û kêrhatî. Eger em ser vê gotinê zêde kin wê yekê, ku jîyana çivaka kurda berbiçeve bi lokalîzasîa erf-edet û xeysetê patrîarxalîêva (û ew heta iro jî zêndîye), wî çaxî pêywîstyâ

lêkolînên peyva kurdaye zar diha mezin dibin ne ku tenê bona dîharkirin û şirove kirina medenîeta cimeta kurda, lê usa jî bona femkirin û bervedan û makkirina gele prosêsên Rohilata Nêzîke êtnîkîê û çivakîyê, bîrû bawerîyê û êstêtikîyê.

Gava anegorî xwestinê zargotzanîye naха dîroka berevkirina çîrokên kurda ya sedsalya derbazbûyî em bidin kivşê, divê li xwe mukur bêñ, wekî wê derecêda heta naха gelek şuxul nehatîye kirinê.

Edetê (tradîsîa) berevkirina xebera kurdaye zar ji nîvê sedsalya nonzde destpê dive. Vê derecêda hîmlî guh dane ser efrandinê hilbestkî-poëtikîê, efrandinê bi janra êpîkîê, stranê şera, yên dîrokîyê.

Cara pêşin zanyarêñ Avropaê û ûris cêrbandine çîrok qise û gotinêñ pêşîya berev bikin, nîta wana bûye efrandinê zargotinê berev kin ne ku çawa yê usa, lê çawa qinyat, têkst bona lêkolîna qeydeqanûnêñ zimanê kurdî, rêzumana wî. Bi vê nêtê jî Avgûst Jaba, Prûm, Sotsîn, Yêxyazarov, Oskar Mann û yên mayîn qinyatêñ zargotinê tomer kirine.



Çîrokbêj H'emîdê Dewrêş tevî Casimê Celîl (sala 1930)

Gavêñ berevkirina çîrokên cimeta kurdaye pêşin bi şêweyê zanîyarî ji alîê folklorzanêñ sovêtîê ji salêñ 30-î hatine avîtinê û salêñ dirêj berdewam kirye.

Pêra jî divê bê destnîşankirin, wekî di dereca berevkirina zargotina kurdaye dewlemendda, bi taybetî ya çîroka, mijûlya û gotinêñ berêda, hela hê gere gele tiş bê kirinê.

Cihana çîrokên kurdî zengîn, berfire û pirawaze. Çawa bal gelêñ mayîn, nava çîrokên kurdada jî cîkî sereke yên sêrbazîê (tiştên ecêv) û debê (jîyana rêal) digrin. Kêm nînin, usa jî çîrok-gotinêñ berê, yên hûmorîê, pêkenînê, ser terewilada û yên mayîn.

Çîrokên kurdaye sêrbazîê xwendevan cîguhêzî dema berê dikin, çaxê hê meriv nikaribû dijî hêzîn sirûştê şer bikra. Lê merivê xebatkar timê jî xwestîye, xem û xîalê

wî bûye, wekî hêzên sirûştêye dijmin bindest ke, serwêrîê li batinîê sirûştê bike û mecalên jîyana aza, têr, tijî û bextewar çê bike. Aha bona ci nava çîrokê sêrbazîêda di dereceêن here çetinda tişt û ruhber bi zoraya sêrê têne hewarê, komekdarîya mîrxasa.

Motîveke çîrokê sêrbazîêye here hizkirî û belabûyî syûjêa Şarûr Bilbile, sêva qudretêye, avilheyatêye, dora kîjana gele motîvên mayîn hatine avakirinê. Nîşana hêza hişyarbûna sirûştê, bextewarîya merivin şarûr bilbil, sêva qudretê, avilheyatê, destxistina kîjana gele çetinayara girêdayîye. Hêza mîrxasên çîroka mîna ya şerane. Ewana gelekî aqilin, ji gele çetnaya û hasêgeha derbaz dibin û ser dikevin. Dighîjine bextewerîne ku tenê bi mîrxasîya xwe, lê usa jî bi rehma dilê xwe, bi helalî û şekîdarîa xwe, yan jî bi xeysetê xweye başva.

Berê wê altindarîne ku tenê mîrxas tem dike, lê usa jî gel, merivên xebatkar, gundî, cotkar dixun. A bi vî teherî gel bi tomerîkirina kûrfikir rê û dirbêñ berbi jîyana bextewar û helal nîşanî meriva daye. Motîv û syûjêtén wan çîrokê cimeta kurdaye sêrê yên pesnê serdayê helalî û mîrxasîde didin mînakin çîrokê Dewîdark; Xatûn meymûn; Zilfînaz û Cîlfîferaz; Kurê belek; Ahmedê nêçîrvan; K'uçuk Evdile; Mirîdê Zozanî û yên mayîn.

Di gele çîrokanda ew şerkarî, yak bona azakirina qîzêñ revandî, bedewêñ, ku sêr zulmê anîne serê wan, tê kivşê. Hene çîrok, ku ser şerkarîya bona batmîşkirina wan qewatêñ xirave zordar dixwazin zengînîya sirûştê ji gel bistînin, talan kin. Mîrxas xûna xwe didin ber çevê xwe û hebûna cimetê lê vedgerînin. Bona mînakê em bîr bînin çîrokê Sêva Sêling; Mîrze Mehmûd; Gulbarîn û yên mayîn. Pirhijmarin usa jî dîdem û syûjêyên bi bûyarêñ ecêvva girêdayî. Di wan bûyaranda roleke mezin dilîzin tiştên nişkêva, raserîbûnê pêkhatî.

Nirx û kemala serecema çîrokê sêrêye moralîê terbiyetdarîe mezinin. Nava çîrokada hemû dereca ruhberêd dilsaş û zêrandî, merivên bê pişt û zîyankêş têne parastinê. Mîrxasê çîrokaye hizkirî timê diçin hewara wan, ji dereca teng derdixin. Lê bi heqî mîr û hakimên bêîsaf û zorbe, merivên xirav û mixenet têne cizakirinê. Mînaka wê yekîye tîpîke çîroka Çilkezîê. Li vir mîrxasa jin pey çetinaêñ mezinra dîghîje altindarîe û ji heqê cil herevbaşa, padşê zulmkar û keşîşê decal tê der.

Di vê çîrokêda tevî ramana navarokêye bingehîn, şerkarîya dijî xiravîê, li rex altindarîya qencîê, ramana merivayê û heqîjî pêşda tê kişandinê. Eva têma hub-hizkirina eyan û helale, ku cimet li davîyê bi optimîstî, bi bawarbûna mezin berbi qencîê eşkere dike. Têma hub-hizkirinê, ku pêşîya wê hezar tengî û hasêgeh hene, nava çîrokada têmake gelekî naskirîye. Gel ji vê têmaê pir hiz dike, loma axirîya wê timê ya geş, xêrê û altindarîye (mînak: Sêva Sêling-e).

Kîne ew hêz, ku çîrokada xwe eşkere dikin. Hîmlî ew qewat para vedibin ser du bira: mîrxasêñ qenc û xjav. Hêzên qenc di çîrokada hîmlî pêşda têñ bi huner, pêşe

û ruhê xwe. Ew wekîlên gelê xebatkarin, ji paşla wê derketine: kurê mesîgir, gavan, şivanane; ji rêza kurên padşa kurê herî biçûke, ku bi xeyset, nêt û meremê xwe dijî birayên xwe yên mezin dertê û anegorî xwestinên gel, anegorî kara wêye. Hêzên xirav, ew padşane, wezîr-wekîl, eyan, teyanê padşêne, merivên dora wîne; ew zîya, dêwê h'eftserî yanê jî sêserîne, ewên xweyê xizne û defîna bêhed û bê hijmarin, xweyê welêt û koçik-serane. Carna çawa hêzên xiravî pêşda têncarênen qelpe xap-xapo, lê usa jî wekîlên ayîna dîn û hevalbendê wan-pîrên sêrê.

Mêrxasê çîrokêyî qenc pey gele çetnaya, çawa divêjin, oxiirmê giranra dighîje meremê xwe. Mêrxasîya merivên qenc wê bê nêt û merem bûya, eger ewî ser rîya xweye çetin parî nanê paşin bi kesîv-kûsîvara, hevalê rêra ker nekira, yanê jî alîkarîya bêqelp neda merya. Paşê dor û ber: merî heywan, teyr û tu, mesî bin wê qencîya mîrxas, bin emekê wî dertênen. A eve dereceke çîrokaye moralîê-şîretkarîê, qencî timê tê ber qencîê, hêza qenc, baş timê serdiikeve.

Mêrxas wexta şûxûlkirina xwe tenê nîne. Rêva merivên nenas, terewil û heywanet, yên nava xeysetê wîda qencî û mîranî, merdî dîtine, têne hewara wî. Tevgirêdana şuxulkirina mîrxas bi merivên doranara, bi dinya terewilara piştovanîyê dikin, wekî mîrxas tik-tenê, çawa merivekî xweperest-êgoîst neê kivşê û bi wê yekê nîgara wî dikin ya diha dêmokratî, sade û merivayî. Eva yeka xeysetekî mîrxasê gelêriye bingehîne nava hemû janrên berhemdarya zargotinêda.

Xiravkar, yanê mîrxasê çîrokayî neqenc bi kirinê xwe qelpe, derewîne, timê lêpa dike, dixapîne. Ew himberî qencîê û başîê radiweste, şerkarîê dike. Nêzîkî aqilane, wekî nava qewlîn usada şuxulkirina wî bive-neve divê biteribe, ew jî bê cizakirinê.

Kêm hewaskar nînin usa jî çîrokê debêye rîêlîê, bi navaroka bûyar, gîlî-gotinêni jîyana rîêl û herrojîyê. Em vira pevgrêdanê orta serwêrya dewletya û merivên zêrandî divinin. Ser meydanêne dewletî û xulam, axa û kesîv. Nava çîrokêni ji vê rîzê gel bi hûmora tûj ser mîr û hakima dikene, bi dewletîya û talançîê keda xebatkara dikene. Çawa qanûn nava çîrokêni hûmorîêda merivên sade: xulam, şivan, hambal û yên mayîn pêşda têncarênen çawa merivên gele aqil û femdar. Ewana zanene, jêhatî û timê aaxê xwe alt dikin û wana dikin nava halê pêkenînê. Nava çîrokêni debê, hûmorîêda divin robet dewletîyê netêr, zulmkar. Bi hûmora tûj bêqanûnî, têrnexarî, qelpî û nemerdîya wekîlên ayîna dîn tê dîharkirinê. Nava çîrokêni kurdîye hûmorîêda syûjêa usa gelekin, çaxê nişkêva rûê levhatinêda merivên nelaq û nehêja divin xweyê sîanetê û dîwanê. Nava çîrokêni ji vê rîzê, cimet kirinêni merivên tirsonek û bêkêr belû dike, pê dikene yên ku nişkêva ji rûê levhatinê nav û dengê merivê mîrxas û aqilbend dest tînin û hela serda jî dîghîjin text û payê padşatîê. Çîrokêni ha, wek Elîyê newêrek, Silêmanê newêrek û yên mayîn, bi vê yekê qeydeqanûnêni ser neheq û nerast, zulmkarîya jîyanê nîşan didin, bi hunera pêkenînê dijî kedxura dertêni. Çîrokê debêda usa jî cimet ser kêmasîen xeysetê meriva, robetîen emrê herrojî dikene.

Nava çîrokêن gelê kurdaye rêalîeda cîkî berbiçav digrin yên şîretkarîê. Nava vanda cêribandin û aqilbendîya gel ku ji kûraya sedsalya tê, hatîye parzûnkirinê û sixkirinê. Merivên kesîv, ku bi keda helal dijîn, çend quruşen xweye qazanckirî bi dil û eşq didin wî dewrêşî, ê ku şîreta difroşe. Ew şîret, ku paşê bextewarîê û hebûnê didin, usa jî wî merivî ji dereca teng derdixin. Ew şîret meriva hînî şâşyan, ji rêderketinê û xapandinê nakin, ewana rastîen here paqîş û helalîne.

Aqilbendîya çîrokê ew dîtina raste, ew kirîyamete, ku meriv karibe tiştê baş û bi nix nas bike, ew çik her merivek nikare bivîne. Ew aqilbendî meriva ji qelpîê, xapandinê û sêrbaziê diparêze. Bona gihîştina rastîyê û aqilbendîya jîyanê, bese, wekî mîrxas çek û rihalê xwe biguhêze, bi kincê dewrêşaye xilmét, derê nava gel, mal bi mal bigere, ku hemû meriv wî nas nekin, nevînin û ewê ji wana rastîê, heqîê nas bike. Motîva qiliqguhastinê nava folklorâ gelên cihanêda gelekî belabûyîe. Nava çîrokêن kurdîda ew motîv bi navê merivên usara girêdaîye, yên çawa şah û padşa dîrokêda navûdengin, wek mînak: Şah Îsmaîl, Şah Abbas, Harûn al Reşîd û yên mayîn.

Nava rêza çîrokêن rêalîeda ew çîrok cîkî berbiçev digrin, yên, ku derheqa jinandanin. Çîrokê vî cûreyî gelekî pirawazin, fikra wan tûje û yê jêhînbûnêne, şîretkarîêne. Ewana pêra jî bi fikra xwe dijî hevin. Cîkî bi hûmora zor bi wan jina dikenin, kîjan bêkar, tembel, bê şam û şuretin, bûk û jinêb bêkêrin. Lê cîkî dinê ewana kevanî-xanimêن pêşekar destemelin, çawa cimet divêje, tilîê wana zêr dibirin. Ewana rojên oxiirmê giran, çetinaêda bi aqilbendî û helalîya xwe diçin hewara mîrê xwe, alîkarîê didin wan. Ew fikir ya şîretkarîê û jêhînbûnêye, wekî hîmê xweşbextî û xweşbûna halê malê, tifaqa mîr û jinara girêdaye, wê yekêra, ku ewana rind ji hev fem dikin.

Nava emrê kurdada rola jinê mezine, him emrê çivakêda, him jî malda. Badilhewa nîne, wekî nava çîrokê gelê kurdaye rêalîeda pirin him jinê delkbaz û qelp, him jî yên aqilbend. Ewana gele cara alîkarîya padşa kirine, wekî ew welat û gelê xwe ji rewşa here giran derxin.

Nirxa çîrokêن kurdaye bedewetiê, têgihîştinê gelekî mezine. Fantastîka çîroka û xewnerojkêñ gel timê ser jîyana rêal, rewş, dereceen jîyana çivakîê, abûrîyê vî yanê wî demî bingeha xwe girtine. Û eger di çîrokada cîkî mezin digre şerkarîa himberî dêwêñ sê hetanî cilserî, zya û esheba, destanîna tiştêñ çetine ecêv, lêgerîna xizna û defineen bêhijmar, çêkirina birc û koçkêñ terikî û kaw û tiştêñ mayîn, lê dîsa qewl û dor-berê çîrokaye bingehî û yên sereke ew jîyana gundîaye sadeye bi xanîyêñ ji hev ketî, bi hacet-dezgehêñ prîmîtîv, lê sifetê şuxulê xweye rojê bi xem û xyalê salzemana, bi xeysetê xweyî sade û bêqalî bêqîl, bi peywendîyêñ dilsaş û zelal. Û tiştekî badilhewa nîne, wekî hemû mîrxasen çîrokêñ kurdîye qenc, ew padşa û kurê padşêbin jî, bi kirin û rabûn-rûniştina xwe rastî jî hesav divin dîharkir, piştovanen xwestin û kovana masaêd xebatkaraye berfire.

Normên peywendîyê çivakîyê û merivayê di çîrokada hema wî teherî dîhar dikin ew rewş, ew dewran û jîyan, nava kîjanîda gel debirîye, derbaz kirye. Çetine çîrokekê bivînin, ya ku dîhar neke deb, rabûn-rûniştin û hal-wextê gelê kurda.

Nava dîdemên wan çîrokaye geş û pirawazda em wan mecal, qewlên topraxê û klîmaê divînin, nava kîjanada gelê kurd jîyana xwe derbaz kirye.

Mecal û qewlên wê jîyanê, hewirdora floraê û faunaê bûne, ku bona şuxulkirin û bûyarêñ çîroka bûne foneke bi reng-awazên ecêve-batinî. Li vira gelekî dewlemend, bi hemû awaza nitirandî rastî me tê sirûşta çayâbi sifet-dîmenên xweye nêzîkî ruhê kurda. Bûyar ber kaniêن pala çiya, gelî-gebozeen kûr, şkeft û zera pêk têن, tevî wan divin teyr û teyrede, gur, rûvî û terewilên mayîn.



Xanima Celîl, ser destê rastê çîrokbêj Gula Xudo (sala 1957-a)

Xwexwetîêñ çîrokêñ kurdîye bedewetîê mezinin. Çetine meriv nêta tam derheqa wan xwexwetîyanda bide, çimkî cûre-mecalêñ wane dîharkirinê, hunera zimêñ gelekî pircûre û dewlemendin. Çîrokêñ kurdîda gelekî baş dîmenên ecêvşirovekirinê bi dîmenên rîalra hatine pevhûnandin, lê usa jî pêkenîya xeder û hûmora nesert, tomerîkirina moralîê û sosîalîê û êd mayîn.

Çimkî di çîrokada heye hêza xeberêye êmosîonale alavî û pirawazbûna elamkirinê, ji ber vê jî zimanê wan zengîn û bi bandûrmezine, bi cî û war û sadeye.

Hêza çîrokaye hukumdar ne ku tenê pêşdaçûyîna kompozîsiâ wane navarokêdane, lê usa jî wê kolorîtê û cûreyîdane kîjan mecal-cûrêd eyankirinê dide wan: wekilandin, êpîtêt, sîmvol, gotinêñ miqîmîye berk.

Çîrokada kanîke dewlemendkirina zimêñ, cûrê gotinêye bedewetîê hesab dibin gotinêñ pêşiyane gelêrî, yêñ aqilbendîê, ku di nava deba merivada bingeha xwe danîne. Çiqaşî di çîrokada pend û gotinêñ pêşya gelekin, haqaşî ew çîrok diha

hukumdar û bi reng-awazê geşva li serê guhdara rûdinîn. Çîrokbêjên kurd nava çêrkirinên xweda gele cara gotinên gel, biwêjên lakonîke kurt kar tînin. Tenê di çîroka "Sêva Sêlingda" em rastî bi dehan mesela û gotina tê. "Silametî milametîê çêtire", "Hatî ji çûyane" û êd dinê.

Gele cara çîrokbêj xeber, gilî, êpîtêtêni xwe nava cumlêni çîrokêra dike, ji navê xwe bûyanan, kirinên mîrxasa dinirxîne, dipesine. Zarbêj tenê şirovekirê pasîv nîne, ew alîgire, piştovanê kirên mîrxasê xwe yê başe. Ew bi aktîvî tevî bûyanan dive, bi întonasiaên deng, teqladanê û paûza (navbirâ), berxweketin yan jî şabûna xwe dîhar dike. Çaxê çîrokbêj navê mîrxasê gel, mîrxasê qenc hildide, gele cara hizkirina xwe û guhdara himberî wî bi van gotina nav lê dide "filankesê me"; "filankesê te". Di çîroka "K'uçuk" çîrokbêj carna ew wa nav dike: "K'uçuk Evdilê te".

Wexta çîrokgotinê di navbera çîrokbêj û guhdarda pevgirêdana bênavbirî çê dibe. Eva yeka nek tenê ji wê peyda dibe, gava yek divêje û yê dinê guhdare, lê wê demê, gava çîrokbêj bi gilî-gotinê xweva gele cara berbirî guhdara dive. Mînak, çaxê ew oixrê mîrxasra dixaze, usa jî dua li guhdara dike. Eva yeka wî çaxî jî diqewime, wexta çîrokbêj gilî nepak derheqa mîrxasê xiravda divêje. Van derecada orta çîrokbêj û guhdarada dîalog pêşda tê.

Wa, mesele, çîrokbêj remê padşê mirîra dixaze: "Padşa diçe remetê, reme li dê û bavê hazira be jî". Guhdar gerekê cabê bidin bêjin: "Reme dê û bavê te jî be". Cîkî mayîn çîrokbêj divêje: "Kirâse xezevê, dûrî ji hazira, stukurêdane", yanê jî "Sive li hazira ron bû, wana jî". Û êd mayîn. "Hazir" li vira guhdarin. Çîrokbêj wexta hêrs jî dikeve, bîr nake bi gotinên xwe guhdarîê û dilovaniê himberî guhdara dîhar ke. "Dûrî hazira", "Haşabihîstina we" û gotinên mayîn, ser maqûlya, kultûra mezin, ku di tradîsîona nava çîrokêni kurdada heye, şedetiê didin. Maqûlya ha taybetya ziman, axaftina kurdîye û ev ne ku tenê wexta çîrokbêjyêda cî girtye, lê usa jî wexta xeberdana herrojîda, li hemû dera, li seranserî Kurdistanê.

Zimanê çîroka hîmlî bi wê yekê berbiçeve, wekî nava wîda xebera raste-raste dialog pirin. Lî cûrê şirovekirinê kêm tê xebtandinê. Eva yeka xeberê diha zêndî û bi bandur dike, jîyan, ruh û êmosia dide gilya, ku bi devê mîrxas têne gotinê. Çîrokbêj wê xeberê bi dîmenenê ekil û geş, bi gilî-gotinê gel perwede dike û bi wê yekê xeysetê her mîrxasekî cude dide kivşê, nirxdar dike şuxulkirina wî. Zimanê zargotina gel îlahî çîrokaye bedewetîê hesav dibe çevkanîke xurt bona pêşdaçûyîna edebiyeta gelê kurda, dewlemendkirina wê.

Berhevdan nîşan dide, wekî hemû wekîlîn edebiyeta hemcihanîyeye navdar zargotina gelê xwe blind qîmet kirine û gele qinyat ji xezna wêye zimîn, ji syûjê û nîgarêni wêye hewaskar hildane û di berhemên xweda kar anîne.

Şayîrê ûrisayî mezin A.S. Pûşkîn ne ku tenê syûjeyê çîrokêni ku ji lela xwe bîhîstibûn, kirin bingehê poêmên xwe, lê usa jî bi komekdirîya ziman û hunera

gel, zimanê berhemên xwe gîhand dereca sadebûn û ferihbûnêye gele blind. Nava miqaleke xweda, çaxê Pûşkîn derheqa nirxandina çîrok û qinyatên zargotinê xeber dide, usa jî ewê yekê destnîşan dike, ku ew hesav dike çawa mecaleke kûr bona femkirina taybetmendya zimanê ûrisî.

\* \* \*

Çîrokêñ gelê kurdaye vê bendê cara pêşine têne çapkirin. Ewana hatine jêniyîsarê ji zarê çîrokbêjên, ku Ermenîstanêda dijîn. Ew hîmlî binelîñen nehîñen Telîñenê, Hoktêmbêryanê û Abovyanêne. Lê bi fikra jîyîna nava debêda goveka belabûna çîroka diha fireye. Ewana haqasî jî têne gotinê usa jî li Elegezê û Ecmâzînê, cî-warêñ Ermenistanê û Gurcistanêye mayîn. Eger em hildin ser hesêv, wekî paê binelîñen Ermenistanê û Gurcistanêye kurd hîmlî hêna şerê hemdinîaêyi pêşin ji Türkîyaê koçber bûne hatine, wekî usane ev çîrok, bêfitya, usa jî nava kurdêñ Türkîyaêda hatine gotinê. Şedetîya vê yekê hema xût çîrokbêj didin, kîjana hela hê di zarotîya xweda li Türkîaê gele cara ev çîrok bihîstine, bîra xweda xwey kirine.

Çimkî çîrokbêj ji çivakeke êtnografiê: kurdê êzdlîne, topraxekêda, cîkî jîyane, loma jî zimanê çîroka yeke, zaravê kurmancîya bakurêye, yê Serhadêya.

Qewlêñ lap başqe-başqeda çîrok hatine jêniyîsarê. Piranîya wana li sala 1972-a gotine. Çîrok wexta êkspêdîsîaên lêgerînê, li deşt û li zozana alîê meda denggirtin jêniyîsarê. Li çîya, di binê konêñ kurdada û gundada, klûbêñ kolxoza, çaxê cimeta giran li wir hazir bûye, usa jî li malêñ çîrokbêja, wexta kes li wir hazir nîbûye. Wa, mesele, çîroka "Avçi Ahmed" li çîya-eylêd Aixmaşanê hatîye dengnvîsarê, lê "Dewîdark", "Îngîls Çawîş" klûba gundê Geltoda li nehîya Telîñenê. Paê çîrokayî pirê ji alîê Feremezê Ezdo, Osêê Şebab, Hemzoê Bedoda malêñ wanda hatine jêniyîsarê, çaxê du-sê guhdar li wir hazirbûne. Cî û qewlêñ dengnvîsarê hukmê kivş li ser cûrê gotina çîrokbêj, zimanê wî nehîştine. Timê jî wana bi dil û ced, bi hewaskarî çîrok gotine. Cûrê jêniyîsarê jî bona vê yekê mecal-qewlêñ baş çê kirine. Çîrokbêj ber mîkrofonê bê navbirî gotye, carna bi xeberê qenc berbirî me bûye, em jî kirine tevbûyîn qinyatê çîroka xwe, qewmandinêñ wê. Û ewî wê demê bîr kirîye, wekî mîkrofon ber wî danîne. Eva cûre ji cûrê jêniyîsara bi destnîşar baştire, çimkî mecalê dide, wekî hemû awaz, teqlêñ zimêñ bêne dengnvîsarê, hemû dîalog bi dewlemendya zimanê gel bêne xweykirinê.

Çîrokbêjên vê bendê, ku me nimûnêñ zargotinê jê hildane, bi dereca xweye sosîalîê gundî-kolxozañin, salêñ xweva weke hev nîbûne. Nava wanda hebûne merivê ji 40-salî heta 80-90 salî. Ewana gişk jî mîr bûne xênj yekê, ji Gula Xudo (55-60 salî). Bi xeyset û fîkrêñ xweva firqîya wan heye, lê wexta gotina çîroka tev jî mîna hev bûne, tev jî bi dil û eşq, bi dilxweşî û bi êntûzîazm çîrok gotine.

\* \* \*

Çend peyv derheqa şertên weşandina têkstên vê bendê yên têkstologîeda.

1. Bendêda hîmlî ew şertên têkstologîê hatine parastin, yên hatine qebûlkirinê û xebitandinê bona çapkirina çîrokêن gelên dinyaê bi akadêmîsî. Me giranya baldarya xwe daye ser jêgirtina çîroka ser şîrîta dengnivîsokê. Bi vê mêtodologîê me parastye zelalya gotina çîrokbêja, ziman, zarav û taybetya axaftina wana.

2. Çîrok hene ser syujêtekêne, ku çend zarbêj mera gotine, hilbet her yek bi taybetya huner û hêza zimanê xwe. Cîciya navaroka wana ji hev dûr dibin, cîciya bûyarên nû yênbicûk çîrokada cî digrin. Ji ber ku her çîrokek mafê wê heye jîyandar be û kêrhatî be bona xwendevana û zanistyê, me wana bê bijartina kîjanî başe, çêtire yan qelse, xirabe, raberî çapê kirine û ewana di rêza çîrokênu ku zarbêjek gotye cî girtine.

3. Berhemên ser şîrîta dengnivîsokê tomarkirî dema jênivîsarê ser kažezi rîdaktorî lê nekirine, tu tişt neguhastine, hîştine her ûsa çawa zarbêj gotye. Peyvên bîyanî, yên ji zimanên cînara, ji cîyên dereke hatine ketine zimanê me, yan jî bi cûrê nerast hatine gotin, me rast nekirine.

4. Navê çîroka usa mane, çawa çîrokbêja gotine. Ewana paê pirê ser navê mîrxasên çîrokaye serekene.

5. Raste çîrok gişk bi zaravekî, bi zaravê kurmancî hatine jênivîsarê, lê dîsa hine xeber ji alîê çîrokbêjada mîna hev nehatine gotinê, firqya kêm orta wanda heye. Teybetya sewtgotinê me hîştye usa, çawa çîrokbêj gotine. Di têkstada dikarin rastî çend cûrê nivîsarê peyvekê bê, mînak: *xay kirye; xuy kirîye; xwey kirye*.

6. Guhdarîya taybetî hatye dayînê ser mînahevbûna niqitdanîna çîroka. Nava têkstada cûrê niqitdanînêye sade û mîna hev hatîye parastin. Xebera raste-rast (dîalog) ji rêza nû despê dike û ber hevokê cixîza bicûk heye.

7. Amadekera guhdarîke mexsûs dane ser peyva *go* yak alîê çîrokbêjada gele cîya hatye karanîn. Amadeker cedandine *go* rast, bi cî û war bê nivîsîn, usa, çawa zarbêj kar anîye. Fûnksyona xebitandina *go* nava tekstada pirfikre û rola întonasîonê û gramatîkaê diqedîne.

Carna *go* du cara pey hev têne gotinê. Meriv tirê ewana yekin û çîrokbêj zêde gotye. Lî na. Bi dîtina amadekera karanîna *go* bi manewîye û lêkolîna ser wê ya berfire bona zanistyê duarojê wê kêrhatî be. Ji ber vê jî cedandine têkstada *go* tam xwey kin. Bi vê yekê kirine, ku zanyar karibin guhdarîya xwe bidin ser vê. *Go-ê*, ku xebera raste-rast (dîalog) ji peyva şirovekirinê cuda dike ji herdu alîya bi vêrgulê û ciçîzê tê başqekirinê, lê *go-ê* întonasîon tenê bi virgulê. *Go-ya* întonasîon ji xebera pêşîê yanê paşîê tenê bi vêrgulekê tê cudekirin. Gava zarbêj *go* du cara pey hev kar tîne, yek bi întonasyon ji yê dinê cuda dive, ew *go* rola vêrgulê dilîze.

8. Amadeker spêşîfîka têkstaye zarava neteribandine, her usa çawa cûrêd sewta xebera jî. Rastnivîsara têksta bi cûrekî, awakî hatye dayînê. Wa mesele eger çîrokbehêjek cûrê xo daye xebatê wekî usane bal wî em tenê rastî xo têن, lê bal yekî mayîn cûrê xwe yanê jî xu-ye. Dijwarî hebûye, gava zarbêj xo, him xa yan xwe û xo jî gotye, mînakeke dinê, gava zarbêj berhemekêda hem *divê* û him *dibê* kar anîye.

9. Cîwar kirina çîroka nava cildêda anegorî çîrokbehêjatîye pêkanîn. Çîrokêñ ku zarbêjek gotye, bê cudakirin: ew yên sêrêne yan ser jîyana rastin, rex hev hatine derskirin. Şert ewe, wekî berhemên zarbêjekî cîkîda bin.

10. Du zarbêj ku çîrokekê bi motîv û syûjêyêñ xweva nêzîkî hev gotine, yek ji wana me li paşkokê weşandîye.

### **Alfabâ karânî**

A, a	G, g	N, n,	T', t' [Th, th]
B, b	H, h	O, o	U, u
C, c	H', h'	P, p	Û, û
Ç, ç [Çh,çh]	I, i	P', p' [Ph, ph]	V, v
Ç', ç' [Tch, tch]	Î, î	Q, q	W, w
D, d	J, j	R, r	X, x
E, e	K, k	R', r' [Rr, rr]	Ñ, ñ
Ê, ê	K', k' [Kh, kh]	S, s	Y, y
E', e'	L, l	Ş, ş [Sh, sh]	Z, z
F, f	M, m	T, t	